Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 87
15'ê Gulanê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Şandeke PDK Îranê Bi Serokatiya Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî Yê Partiyê Serdana Parleman Û Wezareta Karê Derve Ya Fînlandê Kir**

R. 5




**Nûnereke Jêhatî Di Pêkhateya Desthilatekê De...**



2

**Konferanseke Girîng Li Berlînê**



3

**Heftemîn Civîna Salane Ya "ECOSOC"ê...**




4

**1'ê Gulanê Roja Cîhanî A Karkeran**




7

**JIYANEKE RÛMETDAR**



9

**Muzîka Dermanî**



10

# ÎRAN BİNÊŞA PİRSGİRÊKÊN ROJHİLATA NAVÎN



Heta niha hewl û xebatên dîplomatîk nekarîne şer û kirîza ku zêdetirî hefteyekê ye rastî dewleta Lubnanê hatiye, bidin sekinandin. Di vê derheqê de, Serok Komarê Amerîkayê Buş beriya ku gera 5 rojî a xwe ji bo Rojhilata Navîn dest pê bike, gef ji dewletên Îran û Sûriyê xwar ku dest ji maytêkirinê di nava kar û barên hundirê Lubnanê de berdin. Wî got civata navneteweyî nahêle ku rejîmên Îran û Sûriyê Lubnanê bixin bin destê xwe û siyasetên xwe li wir peya bikin.

Buş di hevpeyvînekê de bi beşa Erebî ya BBC'yê re anî ziman ku rejîma Îslamî a Îranê binêşa pirsgirêkên Rojhilata Navîn e û got ev rejîme astengeke mezin li ser rêya aştî û tenahiya herêmê ye. Herwiha Wezîrê Karê Derve yê Erebistana Seûdî jî li ser kiryarên wê yên maytêkirinê di nav kar û barên Lubnanê de û piştgirî ji Hizbulahê hişyarî da Îranê û ev kiryarên Komara Îslamî bi xurtî şermezar kir.

Kirîza vê dawiyê ya Lubnanê demekê dest pê kir ku dewleta vî welatî sêşemiya heftiya borî kanala telefona Hizbulahê rawestand û **Wefiq Şekîr**, endamê Girûpa Emel û berpirsiyarê balafirgeha Beyrûtê ji kar avêt. Lewra **Hesen Nesrula** ev kiryara dewletê wekî îlana şer da zanîn. Di rastî de ev helwesta Hizbulahê tenê hêcetek bû.

---

## Rewşa Siyasî A Kurdistana Îranê Û Sûriyê Di Hevdîtina Navbera Şandên PDK Îranê Û Partiya Azadiya Kurd Li Sûriyê De Kete Berbas



Roja 11.05.2008'an, şandek ji Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê, bi serokatiya **Xêredîn Murad**, Serokê vê partiyê, serdana Deftera Siyasî a PDK Îranê kir ku ji aliyê şandek ji PDK Îranê bi serokatiya **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê vê partiyê, hate pêşwazîkirin.

Di hevdîtina han de, Xêredîn Murad, Sekreterê Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê, bi berfirehî baseke siyasî li ser rewşa Kurd li Sûriyê û bêparkirina netewa Kurd ji mafên siyasî û mirovî di vî welatî de kir.

Piştre Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li ser rewşa Îran û Kurdistanê û xebata netewa Kurd û rola PDK Îranê axivî.

Di dawiya vê hevdîtinê de her du aliyan li ser berfirehkirina pêwendî û dostîniya di navbera hevdu tekez kirin.

www.arsivakurd.org

# Nûnerek Jêhatî Di Pêkhateya Desthilatekê De Dikare Bi Bandor Be Ku Li Rexnegirtin Ji Desthilatê Serbest Be

**Mistefa Hicrî**

Gerra Heştem ya binav hilbijartinan Meclîsa Komara Îslamî, di Reşemeya sala 1386(Adara 2008)'an de bi dawî hat û her wek ku pêşdîtin dihate kirin û me berê jî bas kir, mûcîze û behîta sindoqan careke din xwe nîşan da. Serhejmariyeke pirr bilind û zaf ji aliyê rêveberên wê şanosaziyê ve hate îlankirin, cenabê rêber û berdevkên din yên vê rejîmê weke carên berê, spas û pêzanîn ji beşdariya bêmînak an berfireh a xelkê di şanosaziya han de kirin û ragihandin ku vê carê jî gelê herdem amade di meydanê de, bi wê beşdariya xwe misteke xurt û qahîm li devê dijminên Îslamê dan û ew bêhêvî kirin. Weke şîreteke kurdewarî a me ku dibêje: **"Bixwe birrîn û bixwe jî dirûn."** Bi dûr ji çavê nexweyiyan şanoya han rêve bir û bi dilê xwe jî hejmara beşdaran îlan kirin. Amadekar, rêveber û beşdarên şanoya han her bixwe bûn, lewra jî ne tenê rê nedan zêrevan û çavdêrên bêalî ên biyanî li ser sindoqên dengdanê hazir bibin, belku di hinek bajaran de, heta rê nedan ku çavdêrên taqima binav Reformîst jî bêne ser sindoqan.

Ewa ji bilî reşkirina navê wan berbijaran bû ku ne tenê tu dijberiyek tevî rejîmê nebûne, belkî tenê bi gumana cudabîriya herî lawaz a wan bûye.

Şanosazên vê şanogeriya bêşermane û rûreşane bi vê yekê jî nesekinîn û heta heke ew piştî bidawîhatina dengdanê jî bên agahdarkirin ku tiştek ji destê wan derketiye, rê nedin kesên wisan biçin parlemanê û yek ji kesên hilbijartî ji ber ku di nimêja înê de beşdar nebûye, dengên wî berbijarî jî hilweşandî ragihandin.

Ev bezme li ber çavê hemû nifûsa nêzîk 70 milyonî a xelkê Îranê ve birêve çû. Ne tenê her vê carê, belku di destpêka bidestvegirtina desthilatê ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve heta niha eva bo cara heştan e – ji bilî binav hilbijartinên din – her bi navê hilbijartina Meclisa Şêwra Îslamî ve, ev şanosaziya qirêj û biyom ducarkî dibe.

Lê bela û musîbet her bi vê yekê bidawî nahê, belku car bo carê di hinek herêm û navçeyan de bi awayekî tejî êş û azartir derdikeve holê û ji bilî hisret û kul û keserê çi din bicih nahêle. Piştî bidawîhatina gerra binav hilbijartina Nûnerên Meclisa Şêwra Îslamî a Îranê û ragihandina encama hilbijartinê ji aliyê dezgeh û organên têkildar ve di heftiya yekem a meha Banemerê (Dawiya Nîsanê) de, bi sedema vê çendê ku derewa rejîmê di hejmartinan dengan de û îlankirina berbijarên dilxwaztir ên xwe weke serkevtî eyan û aşkera bû, hejmarek ji xelkê dest dan lidarxistina meşê û xuyakirina nerazîbûnê ku çima filan berendam li cihê bêhman berendamî weke serkevtî hatiye ragihandin. Di vê derheqê de xelkê bajarê **Îwana Rojava** li Parêzgha Îlamê bi nîşandana nerazîbûna li dijî fend û fêl û desttêwerdana rejîmê di îlankirin û encama hilbijartinê de, mixabin çar kes hatin kuştin û çendîn kes jî birîndar bûn û li bajarê **Şino**'yê jî bû sedema meşeke nerazîbûnê a aştîxwazane û hinartina şanda nûneriya wan ji Tehranê vê bo gihîjandina dengê tûre û hêrs ê xelkê ji bo dezgeh û navendên rejîmê ên taybet bi vê yekê û nemaze Meclisa Şêwra Îslamî ku bêguman tu bersivek ji wan re nahê dayîn.

Ev bûyere ji çend aliyan ve cihê lêhûrbûn û baldanê ye:

**Yekem:**

Li pey dubarebûna heft caran şanosaziya binav hilbijartina Meclisê û ceribandina heft caran fêlbazî û xapandinê ji aliyê rejîmê ve û meşandina hilbijartinekê ku tu bingeheke hilbijartineke azad pê re ne xuya ye, piştî vê yekê ku heft caran li ber çavê hemû xelkê ve rê nahê dayîn ku nûnerên dilxwaz ên xelkê beşdarî hilbijartinan bibin û heke bi merema bidawîanîna gerra şanoyê îcaza beşdariyê jî ji wan re bihê dan, nahêlin ku serkevin û bi vî awayî ku hewce ye



berevaniyê ji mafê xelkê bikin.

Bi vî halî jî ew komê bo cara heştan e ku di wê dengdanê de beşdariyê dikin û serbarê hemû wan derdane, demekê encama xebatê dibînin, dest didin bi xwenîşandan û xuyakirina nerazîbûnê û weke me qala wê kir li bajareke weke Îwanê kar digihîje cihekê ku hejmarek xelk tê kuştin û hejmarek din jî birîndar dibin. Mîna vê yekê ku ewa bo cara yekemîn e wan di hilbijartinê de beşdarî kirine û yekemîn car e ku berbijarê dilxwaz yê wan bi fêl û qulebaziyan ji ortê tên rakirin! Çi tiştekê ew çavnihêriye di nava wî xelkî de pêk aniye ku di şanogeriya gerra heştem de deng bidin û berendamên dilxwaz ên xwe hilbijêrin?

Bêguman hemû kes dizane ku tu guhartinek di qanûna hilbijartinan de pêk nehatiye, Konseya Parêzvanan her ew e ku di destpêkê de bûye û niha li dijî xelkê tund û tûjtir e, hikûmet her ew Komara Îslamî ye ku nêzîk 30 sala ye li ber çavê wan e. Bi kurtî tu mûcîze û behîtek di vê navberê de neqewimî ye heta çavnihêriyek bêbingeh a wilo di xelkê de derketibe holê, lewra tu rewayî û berheqiyek ji bo beşdariya wî xelkî û li pey wê jî ew awayê xuyakirina nerzîbûnê nahê dîtin.

Eyan e ku rejîm ji bo germ û gurrkirina bazar hilbijartinê û bona rakişandina xelkê bo ser sindoqên dengdanê yek ji wan rêyên ku hilbijartiye, pêkanîna hevrikiyeke neşaristanî û heta dijminatî di nava wan de ye, weke dijminatiya navbera gund û bajaran, hoz û eşîran, zarav û wd... e. Lê eva jî bo yekemîn car û tenê di nava gerra heşan de neqewimî ye, belku weke hemû komplo û pîlanên din ên rejîmê di dema hilbijartinan de ev dubendî û pîlanane dubare dibin.

**Duyem:**

Vî xelkî jê ve ye heke li cihê berbijarê/a dilxwaz yê/a wan, yekî din cihê wî/ê girt, çi guhrtinek di jiyana wan de pêk nahê? Heke em wisa bihesibînin ku kesayetiyên herî jêhatî biçin Meclisê, bi rastî li gor pêkhateya vê rejîmê dikarin çi tiştejkê di wî welatî de biguherînin? Nûnereke/î jêhatî di pêkhateya desthilatekê de dikare xwedî bandor be ku bi awayekî serbest

www.arsivakurd.org

û azad rexneyê ji desthilatê bigire, pêşkêşkirina pirojeyên sûdewar bona xizmetkirin bi wî xelkî û berevanîkirin ji mafê wan kesên ku deng jê re dane, demekê mafên wan tê binpêkirin, gelo pêkhateya Komara Îslamî bi vî awayî ye?

Cihê kul û keserê ye:

- Di sîstemekê de ku yek ji bendên Qanûna Bingehîn ên wê li ser xwendin bi zimanê zikmakî piştî 30 salan birêve naçe.

- Di sîstemekê de ku komek jinên wekhevxwaz bêy vê çendê ku di xebata çekdarî li dijî rejîmê de an heta di meşeke aştîxwazane de beşdarî kiribin, belku tenê bi tawana vê yekê ku xwestine bi piştgirî ji Kampayna Yek Milyon Wajo'yê ji desthilatê bixwezin ku mafê wan bi fermî nas bike, cezayê dirêjdem yê girtîgehê ji wan re tê birrîn û bêhurmetiyê bi wan dikin.

- Di sîstemekê de ku welatî ji ber nedarî, xizanî û kêmdahatiyê, zarok û gurçîlkên xwe difiroşin, lê serwet û heyîna welatê wan ji bo çekdarkirina terorîstan û perwrdekirina wan serf dibe, tê xerckirin, bona vê ku aramî û tenahiyê di herêma Rojhilata Navîn de têk bide.

Çawa dibe em li benda vê yekê bin ku bihêlin nûnerên rastîn ên xelkê herin bo Meclisa hikûmetê û berevaniyê berejwendiyên xelkê bikin? Xwe ev rejîme ji xelkê bêminet e û tenê çaxekê gel tê bîrê ku tirsek ji derve re gefê jê bike, ji bo ku wan bike goriyên mana xwe li ser desthilatê, yan xelkê ji bo dayîna dirûşman bi piştgirî ji hikûmetê rakêşîne ser rê û şeqaman, bona vê çendê ku neyarên xwe li hundir û derve pê bitirsîne.

Bêguman me bi çavê rêz û hurmetê ve mêzeyî berxwedana xelkê li hemberî rejîma Komara Îslamî a Îranê ji bo bidestveanîna hemû mafên zevtkirî ên wan weke azadiya gotin û raderbirrînê, hebûna kar, jiyana baştir û wd... dikin, em piştevaniyê ji xebata mamosta, xwendekar, jinan û kedkarên hişyar û mafxwaz ên Îranê dikin ku di pêxema gihîştin bi azadî û rizgariyê li destê rejîma paşverû a Komara Îslamî ya Îranê de xebatê dikin. Di heman demê de beşdariya xelkê di şanoya hilbijartinê de – her çiqas kêm jî be – û piştî vê yekê jî meş û daxwaza vê çendê ku ev kese biçe Meclisê yan yê/a din û kuştina xelkê di vê rêyê de bi xisareke mezin dizanin. Em bawer in ev cure xelke yê ketiye telikekê de ku rejîmê li ser rêya wan daniye. Ji ber ku ew kesane li batî vê ku di rêya xebat û berxwedan ji bo hiloşandina rejîmê û bicihanîna daxwaziyên bingehîn ên wan de bihên zîndanîkirin û werin kuştin, daxwaziyên wan ew qas nizm û bêmifah in ku heke bicih jî bihên, tu guhartinekê di jiyana wan de pêk naîne. Di rastî de ev cure meş û nîşandana nerazîbûnê ji rêderxistina xebata rewa a xelkê ji bo rizgariya yekcarî a wan e. Lewra rûyê qisa me ji wî xelkî ye û em ji wan dixwazin ku bêhtir bifikirin û bi hûrî komplo û pîlanên rejîmê binirxînin, bona vê yekê ku mafxwaziya wan heder neçe û têkelî tevgera xelkê a resen û reh û rîşal dakutayî a civala Kurdistanê bikin.

# Helwêstên Komara Îslamî Bû Mijara Konferanseke Girîng Li Berlînê

Roja 2 û 3'ê Gulana 2008'an, konferansek li ser navê "liv û tevgera hercar? Rejîma Îranê, şer li dijî Îsraîl û Rojava û herwiha dijkiryara Almanyayê" ji aliyê Encumena Berlînê ji bo aştî di Rojhilata Navîn de birêve çû.

Armanca konferansa han şirovekirin û nirxandina zanistî a komek pirsên aloz ên Rojhilata Navîn û peydakirina bersiva wan bû, pirsiyarên wek:

Siyaseta Îranê li hember Rojava, teyarbûna Îranê bi çekên Etomî û bandora wê li ser rewşa ewlehiya dever û cîhanê, gefa jinavbirina Îsraîlê ji aliyê desthilatdarên rejîma Îranê û tirsa biciânîna wan gefan, siyaseta nerohn a Yekîtiya Ewropayê, bi taybetî Almanya li ser pirsgirêka Etomî a Îranê û kêşeyên di navbera Îran û Îsraîlê û di encam de kê û çawa li hember meyandina Uranyûmê ji aliyê Îranê ve dê raweste?

Ji ber vê yekê hejmarek pispor û şareza di warê siyaseta navneteweyî, ewlehiya navneteweyî, Îran, terorîzm û çekên Etomî de, herwiha hejmarek rêxistin û kesayetiyên siyasî û çalakên pirsên jin û mafê mirov hatibûn gazîkirin.

Di nav hêzên siyasî ên Îranê de, PDK Îranê ji bo konferansê hatibû vexwendin. Nûnerê PDK Îranê axavtinek li ser rewşa Rojhilatê Kurdistanê, siyaset û helwestên PDK Îranê li hember pirsên cur bi cur ên Kurdistan, Îran û deverê, herwiha siyaseta





Dr. Mîro Elyar

Ewropayê li hember Komara Îslamî a Îranê pêşkêşî beşdarên konferansê kir.

Beşdarên Îranî di konferansa han de, bi giştî derheq xebata berfireh a jinan û zêdebûna xurt û berfireh a binpêkirina mafê mirovan û tepeserkirina azadîxwazan di Îranê de axivîn.

Encama axavtin û şiroveyên beşdaran bi yekdengî dide xuyakirin ku:

1. Berevajî îdîayên rejîma Îranê, programa Etomî a wî welatî tenê ne bi armanca bidestxistina hêzê ye, belku bidestxistina çekên Etomî ye.

2. Her çawa be, nabe Îran çekên Etomî bidest bixe, rêya çareserkirina vê pirsgirêkê gotûbêj û dîplomasî ye, lê nabe gotûbêj take rê be.

3. Îsraîl gefên Îranê li ser xwe micid dizane û man û nemana xwe di teyarbûna Îranê bi çekên Navikî de dizane.

4. Îsraîl mafê xwe dizane ku pêşî ji programa Navikî a Îranê bê girtin û li hember gefên Îranê mafê parastina xwe heye.

5. Civata navneteweyî dibe li ser wê yekê sax bibe û bilez biryar bide ku bixwe li hember programa Etomî a Îranê raweste an ew erke bikeve ser milê Îsraîlê.

Di vê derbarê de li gor nêrîna beşdarên konferansê, siyaseta Yekîtiya Ewropayê li hember programa Etomî a Îranê nerohn e. Di vê derbarê de biryar hate dan ku şandek pêk bê û daxwaza hevdîtina Xatûna "Angêla Merkel" Serok Wezîra Almanyayê bê kirin û ji nêzîk ve girîngiya pirsê jê re bê baskirin.

Şanda PDK Îranê di vê konferansê de, **Dr. Mîro Elyar** nûnerê vê partiyê di dem û dezgehên Yekîtiya Ewropayê de û **Hecî Cundî** bûn. Vê şandê karî tevî gellek rêxistin û kesayetiyên beşdar ên vê kobferansê jî hevdîtinan pêk bîne.

# Heftemîn Civîna Salane Ya "ECOSOC", Platforma Timî Ya Netewe Û Gelên Xwecih Ên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

**Amadekar: Agirî**

Îsal bo cara yekemîn nûnerên partî û rêxistinên neteweyên Kurd, Belûç û Ereb bi nûnerî ji aliyê Kongireya Neteweyên Îrana Federal, bi awayê serbixwe û herwiha PDK Îranê bi nûnerî ji aliyê UNPO'yê ve, di heftemîn civîna salane a Pilatforma Timî ya gel-netewe û akinciyên xwecih yên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ku di binkeya navendî a NY ji roja duşem 21'ê Nîsanê heta roja înê 2'ê Gulana 2008'an li bajarê New York'ê hate lidarxistin, bi awayekî çeleng beşdarî kirin.

Civîna îsal bi peyama vîdeoyî a **Ban Kî Mon** û piştre bi axavtina **Aywa Mîrals** Serok Komarê Bolîvya dest pê kir. Naverok û mijara eslî a komcivîna îsal, nîştiman û mafê mifahstandin ji çavkaniyên xoristî weke çareseriya arîşe û kêşmekêşên etnîkî û neteweyî, jinavbirina ekosîstemê, xwendin û axavtin bi zimanê dayîkê, guhartinên ekolojîk û cewî di xwezayê de, berhevkirina qanûnên navneteweyî bona berevanîkirin ji mafên neteweyên xwecih ên heyî li welatên cur bi cur ên cîhanê di vê sedsalê de û têkiliya karî a nêzîktir tevî karê Konseya Mafê Mirovan ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bûn.

Ji ber guhartinên pirr kûr û bingehîn, hem di warê çendatî û him di warê çawaniyê de, nemaze guherîna straktora Komîsyona Mafê Mirovan a RNY, guhartin û avakirina Civata Mafê Mirovan a nû di cihê wê de, girîngiyeke taybet dabû civîna îsal. Di Îlona 2007'an, danezana parastin û rêzgirtin li mafên gel û neteweyên xwecih û kêmaniyên etnîkî, piştî 20 salan ji aliyê rêberên hemû welatên endam ên RNY hate pejirandin.

Endamên Pilatforma Timî 16 kes in ku nîvek ji aliyê welatên endam ên NY û nîva din jî ji çalak, pispor û nûnerên netewe û qewmên xwecih û rêxistinên nedewletî (NGO) tên hilbijartin.

Îsal bo cara yekemîn Komara Îslamî dîplomateke jin a xwe bi navê **Peymane Heste** ji vê Platformê re nasand û bo dema sê salan kire nûnera xwe di vê Saziya Neteweyên Yekbûyî de.

Bêtirî 1300 nûnerên gelên xwecih li seranserî cîhanê, nûnerên dewletan, rêxistinên nedeweletî ên navneteweyî(INTL NGO), rêxistinên pispor û rêveber ên Neteweyên Yekbûyî, Banka Cîhanî, nûnerên Parlamentoya Ewropayê- ku komcivîna herî mezin derheq hiqûqên etnîk û neteweyên xwecih û bindest e- di vê civîna binkeya navendî a RNY li "New York"ê de beşdar bûn.

Ev komcivîna salane vê derfetê ji bo gel û etnîkên xwecih û akinciyên eslî û kêmaniyên neteweyî pêk tîne hetanî rewşa



xwe a mafên mirovan di asta navneteweyî de bînin rojevê û nûnerên wan di bas û nîqaşên civînê û baskirina rêyên çareseriya rewşa han û herwiha standard û normên mafê mirovan di asta navneteweyî û çawaniya bidestveanîna hiqûqên van netewane pêk bînin.

Pilatforma Timî a Entnîk û Gelên Xwecih, weke organeke şareza û lêzan tê hesibandin û Neteweyên Yekbûyî pê re




dişêwire û derbarê baskirina sedem û bingehên arîşe û kêşmekêşên navbera gelên xwecih ên bindest ji aliyekê û ji aliyê din jî dewletên desthilatdar û gelên zal alîkariyên hêja û berbiçav bi rêxistin û saziyên navneteweyî re dike. Her çiqas xebatên Pilatforma han a navneteweyî ji sala 2000'an virde dest pê kiriye, lê ji sala 1994'an ve ji aliyê Konseya Mafê Mirovan a RNY, ev esl weke yek ji armancên herî girîng ên dehsalê (dehsala mafê mirovan ya gelên xwecih) kete rojevê û pejirandina daxuyanî û biryarnameyeke cîhanî bi piştgiriya etnîk û gelên xwecih û bindest ji aliyê Konseya Mafê Mirovan û niha jî ku gelaleya han yê ketiye ber destûra karê Civata Giştî a NY ji bo ku bibe qanûn û biryarnameyeke pejirandî a navneteweyî hatiye pêşkêşkirin, girîngiya wê ji me re dide xuyakirin.

Ji aliyê neteweyên Îranê, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, Partiya Hevpêwendiya Demokratîk a Ehwazê û Partiya Xelkê Belûçistanê beşdarî civînên vê gerra Palatformê bûn û her yek ji wan rewşa mafê mirovan di herêmên xwe de ji endamên hertimî ên Pilatformê re şirove kirin. Wan sê partiyane bi nûnerî ji aliyên gelên Îranê di panelên civînan de axivîn û gellek çalakî lidar xistin. Wan li derveyî hola civînê daxuyanî û dukoment û wêneyên şehîdan û îdamkiriyên xebatkarên azadiyê li Îranê bi destê rejîma dîktator a Komara Îslamî belav dikirin. Sê partiyên han weke nûnerên Kongreya Neteweyên Îrana Federal û Rêxistina Gel û Neteweyên Bênûner (UNPO) jî gotar pêşkêş kirin û bo cara yekemîn pirr bi başî pirsa pirneteweyîbûnê li Îranê xistin berbas ku heta niha tu rêxistineke siyasî a Îranê nexistiye beev yek nekiriye û, ji nûnerên bêtirî 50 welatên endam re şirove kirin, û bala wan kişandin ser vê pirsê. Ew ronvekirina han bû sedem ku şanda nûneriya Komara Îslamî a amade di civînê de dijkiryaran ji xwe bide nîşandan û bi liv û riftarên ne demokratîk û ne dîplomatîk dixwestin pêşiya axavtin û agahîdana nûnerên gelên Îranê bigirin. Şanda rejîma Komara Îslamî bi hêrs û nerehetî mist li ser maseyên xwe dikutîn û dixwestin ku bi vê rêyê ve rê nedin nûnerên partiyên han ên azadîxwaz biaxivin û rastiyan ji beşdarên civînê re ronî bikin. Êrîşa herî xurt a şanda Komara Îslamî di bersiva gotinên yek ji berpirsiyarên Rêxistina Mafê Mirovan li Ehwazê û heyeta nûneriya Erebên Îranê bû ku ew bi terorsît binav kirin. Şanda Komara Îslamî înkara hebûna pirsa neteweyî û pirneteweyîbûna Îranê kir û berdewam digotin ku me pirsa gel û etnîkên neteweyî û xwecih tune ye.

Helbet divêt were gotin ku ev cure buxtan û tometlêdanên hikûmeta Komara Îslamî di hemû civat û civînên Neteweyên Yekbûyî de li dijî xebatkarên siyasî û çalakên mafê mirovan ne tişteke nû ye û beşdarên vê civînê jî bala xwe nedan wan îdeayan pûç û dûr ji rastiyê. Xala balkêş di civîna heftemî a Pilatforma Timî a Entnîk û Gelên Xwecih eva bû ku nûnerên şanda Îranê di vê civînê de her cara ku diaxivîn, digotin ku Îranê dengê ERÊ û erênî dayiye Danezana Mafên Kêmaniyan û berevaniyê ji mafên gel û neteweyên xwecih û kêmaniyên etnîkî di hemû deverên cîhanê de ye (lê tenê ne li Îranê)! lê piştre haşa ji pirneteweyîbûna Îranê dikirin û dikin.

Xalek din a pirr balkêş a vê civînê eva bû ku piştî axavtin serokên şanda nûnerên Kurd, Belûç û Ereb ên Îranê hemû beşdarên civînê bo demekê û ji bo xuyakirina piştevaniya xwe ji wan, çepik lêdixistin û ev yek ji Komara Îslamî re rûreşî û şermezarî di asta cîhanê de bû.

Beşdariya nûnerên sê gelên Kurd, Belûç û Ereb li Îranê di vê civîna mezin û berfireh de, giringiyek taybet bi xwe heye û bêguman dê bandoreke baş li ser biryar û helwestên wan welat, hêz, alî û kesayetiyên beşdar ên vê civînê bike û ji Opozîsyona Îranê û nemaze xebata azadîxwaziya gelên Îranê re destkevteke dîrokî û bihagiran bû, ji ber ku bo cara yekemîn û rasterast dengê xwe gihandin Neteweyên Yekbûyî.

# Şandeke PDK Îranê Bi Serokatiya Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî Yê Partiyê Serdana Parleman Û Wezareta Karê Derve Ya Fînlandê Kir

Rêzdar Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di sefereke çend rojî de ji bo welatê Fînlandê çend hevdîtin û çalakiyên dîplomatîk ên girîng tevî navendên desthilatdar ên vî welatî weke Parlamento û Wezareta Karê Derve û her wiha Medyayên Fînlandê pêk anî.

Birêz Şerefî bi alîkariya Komîteya partiyê li vî welatê dê bixebite ku bi Kurdên niştecih ên Fînlandê, endamên PDKÎ û malbatên wan û herwiha navendên berevanîkirin ji mafê mirovan û îdareyên hikûmetî re bicive û dê bûyerên herî dawî ên Kurdistanê, Îran û herêmê û siyasetên PDK Îranê ji bo civaka Kurdî û navendên xwedî biryar di pêkhateya dewleta Fînlandê de şîrove bike. Hesen Şerefî bi van xebat û hewldanên xwe ên dîplomatîk dê xebatê bike ku bala wan aliyan bikişîne ser pêvajoya xebata bêwestiyan a gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û piştgiriya wan bikişîne aliyê Kurdan.

Roja sêşem 13'ê Gulana 2008'an, rêzdar Hesen Şerefî beşdarî konferanseke çapemeniyê bû ku Navenda Nûçegihanî a Fînlandî (SST) ji bo wî lidar xistibû. Di vê konferansa çapemeniyê de Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bi hûrî û berfirehî bersiva pirsên nûçegihanê SST'ê da û diyar kir ku Partiya Demokrat daxwaza Îraneke Demokratîk û Federal dike ku têde êdî welatiyê/a derce yek û derece du nemîne û çi din em serdestbûna neteweyekê nebînin. Şerefî ji beşdaran re şîrove kir ku di Îranê de 6 netewe dijîn û mixabin ji bilî neteweyekê, tu yek ji neteweyên din ku Îran pêk anîne û zêdetirî nîva nifûsa welat pêk tînin, mafê xwendin bi zimanê dayîkê ê xwe tu ninin û heta mafê parastina çand û kultura û bihayên neteweyî ên we jî ninin.

Hevpeyvîna han a birêz Şerefî 1 seet dom kir û qirar e ku di derfeta herî nêzîk de dê bi tevahî ji bo raya giştî bihê belavkirin. Hêjayî gotinê ye ku di nûçeyên nîvroya wê rojê de, medyayên Fînlandê bi berfirehî cî dan vê hevpeyvînê û naveroka axavtinên Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û çend dezgeên ragihandinê gera wî weke sefera yek ji rêberên Kurd ji bo Fînlandê hesibandin.

**Serdana Parlemana Fînlandê**

Piştî beşdariya birêz Şerefî di Konfernasa Çapemeniyê de, navhatî tevî şandeke PDK Îranê serdana Parlamentoya Fînlandê kir û bi berpirsiyarê Komîsyona Mafê Mirovan a Parlemana Fînlandê, birêz Taypo Kontola û du kes ji hevkarên wî re hevdîtin pêk anîn û beşdarî civînekê li ser rewşa mafê mirovan li Kurdistan û Îranê bû.



Di civîna heyeta PDK Îranê tevî şanda Komîsyona Mafê Mirovan a Parlemana Fînlandê de, rewşa dawî a binpêkirina mafê mirovan di bin desthilatdariya Komara Îslamî hate şîrovekirin û her du aliyan siyaset û helwêstên xwe derheq rewşa nebaş a mafê mirovan di Îranê de bi hûrî û berfirehî xistin berbas.

Kantona serokê Komîsyona Mafê Mirovan a Parlemana Fînlandê di axavtina xwe de armancên komîsyona han ji şanda partiyê re şîrove kir û got ku em kêfxweş in ku me karî ye ji zimanê kesekê ku li Kurdistanê ve hatiye zanyariyan li ser rewşa mafê mirovan li Kurdistan û Îranê werbigirin û piştre çendîn pirs raberî Hesen Şerefî kirin û wî jî bi berfirehî bersivandin.

Rêzdaran **Mecîd Heqî**, endamê Cîgirê Komîteya Navendî a partiyê, **Xalid Mehebadî** berpirsiyarê Komîteya PDK Îranê li Fînlandê, **Cehanbexş Xalidî** endamê rêveber yê Komîteyê û **Ejîn Rezabî** Endama Rêveber a Yekîtiya Ciwanan di vê serdanê de hevrêtiya birêz Şerefî dikirin.

**Serdana fermî ji Wezareta Karê Derve a Fînlandê**

Her roja sêşem, 13'ê meha Gulana 2008'an, bi serdaneke fermî Kekê Hesen Şerefî û şanda pê re serdana Wezareta Karê Derve a Fînlandê kirin û tevî berpirsiyarên Rojhilata Navîn û Îranê di vê wezaretê de hevdîtin pêk anîn û ji aliyê Ansî Leynu û hevkarên wî re hatin pêşwazîkirin.

Di hevdîtina şanda PDK bi berpirsiyarên Wezareta Karê Derve a Fînlandê re, Şerefî gellek bi ronî û xuya siyasetên Partiya Demokrat ji bo pêşeroja Kurdistan û Îranê ji wan re ragihand û got, me weke hêzeke demokrasîxwaz û azadîxwaz baweriyeke kûr bi serbestiya mirov heye û ji bo mafên xwe ên neteweyî dixebitin. Çavnihêriya me ji dewletên demokratîk û pêşverûxwaz eva ye ku aliyê kêm alîkarî û hevalbendiyê bi dîktatoran re nekin û eva dikare daxwaza me ya herî biçûk be ji we dewletên demokratîk ku baweriya we bi demokrasî û azadiyê ji bo mirovan heye.

Berpirsiyarê Beşa Rojhilata Navîn li Wezareta Karê Derve a Fînlandê jî nigeraniya xwe weke dewleta Fînlandê li dor rewşa zal bi ser Îranê anî ziman û got em weke YE'ê aliyê kêm heftiyê carekê pêdeçûnê bi ser bûyerên rojeva Îranê dikin û weke YE'ê jî helwêst, pêşniyar û heta agahdarkirinên xwe jî di daxuyaniyên fermî de ji desthilatdarên Îranê re îlan dikin.

Birêz Ansî ji aliyê Wezareta Karê Derve a Fînlandê ve kêfxweşiya xwe bi hatina birêz Hesen Şerefî anî zimên ku ev derfete hatiye holê ku agahdarê rastiyan ji zimanê çavkaniyeke cihê bawerî û rastiyê û herwiha dost bûne.

**Hevpeyvîn tevî Kanala 4 ya Fînlandê**

Her roja 13' Gulana 2008'an, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Hesen Şerefî beşdarî hepeyvîneke kanala 4 a Fînlandê bû ku kanaleke sernaserî ye. Di vê hevpeyvînê de jî birêz Şerefî bal kişande ser guhartinên vê dawiyê ên Îran û Kurdistanê û pirsên pêşkêşkarê vê televîzyonê bersivandin.

Xebat û çalakiyên Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê li Fînlandê berdwam in.



Birêz Hesen Şerefî:

**"Çavnihêriya me ji dewletên demokratîk û pêşverûxwaz eva ye ku aliyê kêm alîkarî û hevalbendiyê bi dîktatoran re nekin"**

www.arsivakurd.org



## Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran

omid_anbi@yahoo.com

# SOSYALÎZM

Sosyalîzm ji peyva "Social" bi wateya girêdayîbûn bi civakê hatiye wergirtin û navê xwendingehekê ye ku her ji destpêka serhildana felsefeyê ve bala hemû hizirvan û zaneyên civaknas ji bo aliyê xwe kişandiye û gellek alîgir dora xwe civandine. Merem ji hizra han eva ye ku divêt xelk bi awayekî bikom desthilatdariyê bikin û bi jiholêrakirina hikûmeta tekekesan û milkdariya taybet, jiyana biewle di hemû qadan de were ewle û misogerkirin ku di encama vê çendê de sitem, çewisandin û xweperestî di civakê de ji holê radibe. Eflaton yekem kes bû ku bîr û rayên xwe derheq sosyalîzmê anîn berbas û li ser vê baweriyê bû ku heyîna civakê a hamû endamên wê civakê ye, lewra divêt ji bo hemû civakê were bikaranîn û di diyarîkirina pîşeya takekesan de gerek dewlet hevkariyê bike.

Bi vî awayî rohn dibe ew felsefeya sosyalîstî ku Eflaton pêşniyara wê dike, her ji hizrekê diçe ku bîrmendên Marksîst jî bawerî pê hene û hewla berfirehtirkirina vê didin.

Di sedsalên navîn de fîlesofên Sekolalîst jî li ser vê baweriyê bûn ku milkdariya giştî a xelkê ji milkdariya taybetî baştir e, çunku milkdariya taybet diyardeyek xwezayî nîn e û dibe sedema pêkhatina kirîz û qeyranan û di dawiyê de jî dibe sedema xizanî û destkurtiya şêniyan.

Li sedsalên berê virve û bi serhildana hin saziyan di civakên cur bi cur de, eleqeya takekesan ji sosyalîzmê re zêdetir bû û pirraniya civaknas hatine ser vê baweriyê ku divêt hikûmet ji rêya sosyalîzm û maytêkirina pirraniya xelkê ve werin avakirin, heya ku ji vê rêyê ve vêc û berjewendiya giştî dabîn be û ferq û cudahî ji holê rabin û kar û xebat bi awayekî erênî birêve biçin. Sosyalîzm ji rêya Marks û alîgirên wî ve gihîşte niqteya bilind a geşekirina xwe û ji aliyê hin zana û hizirmendên din ên weke **San Sîmon**, **Foriye**, **Loyî Bilan**, **Pirodon**, **Robert Oyn** û **Norman Tomas**, ve hate bihêzkirin û di encam de pitir ji caran xurt û bihêz bû. Hizirvanên han bi awayekî berdewam mijûlê bas û nîqaşan li ser sosyalîzmê bûn û hewla bihêzkirina bingehên vê didan. Piştî qonaxa han, hin guhartin di bingehên sosyalîzmê de serî hildan ku bûne sedema peydabûna peyv û têgihên nû ji sosyalîzmê re ku digel berê ferq û cudahî hebûn. Di encama vê çendê de sosyalîzm bi ser çend tayan de dabeş bû û hin bas, nîqaş û alîgirên cur bi cur ên wê hatin rojevê ku em dê li jêr bi kurtî qala wan bikin:

1. Sosyalîzma Geşekirî(Evolutionary – Socialism): Alîgirên vê hizrê li ser vê baweriyê bûn ku sîstema bikomelkirina civakê divêt bi aramî û li ser xwe were şopandin, lewra alîgirên han bi Rêvîzîyonîzm(pêdeçûnxwaz) hatine nasîn. Têgiha han bo cara yekem ji aliyê **Birnştayn**, siyasetvan û nivîskarê Sosyal Demokrat yê Alamanî ve hate rojevê. Navhatî li Londonê ji ber bandorên Fabiyan, rêbaza Rêvîzîyonîzmê anî rojevê ku armanca wê miyanerewkirina Marksîzm û guhartina sirûşta wê a şoreşgerane bo modelek miyanerew û tevavker bû. Navhatî di sala 1889'an de, bîr û hizrên xwe li pirtûkek bi navê (Sosyalîsma Tevavker) bi zimanê Almanî anî holê.

2. Sosyalîzma Zanistî(Scientific – Socialism): Alîgirên vê hizrê ji bo selimandina bîr û rayên xwe pişta xwe bi zanist, amar û hejmaran girê didin û nêrîna wan li dijî hizra Marks e. Ew li ser vê baweriyê ne ku sermayedarî berevajiyê vê çendê ku ber bi qelsbûn û jinavçûnê naçe, belku zêdetir di halê geşandinê de ye, lewra divêt sosyalîzmek were şopandin ku pişt bi lêkolîn, amar û wd... girê bide.

3. Sosyalîzma Fabiyan(Fabian – Socialism): Her çend ku bîr û baweriya alîgirên vê hizrê tevî bîr û rayên Marks hevhêl in, lê ew zêdetir balê didin hunera birêvebirin û çavdêriya civakî a kargehan û girtine pêşiya şêwazeke gav bi gav a siyasî ji bo baştirkirina jiyana kedkaran.

4. Sosyalîzma Encûmenî(Guild – Socialism): Alîgirên vê hizrê çalakiyên xwe di çarçoveya civatan de dicivînin û vêc û qazanca kedkaran tenê di çarçoveya kargeh û saziyan de liberçav digirin û bawerî bi avakirina yekîtiyên pîşeyî hene. Hizirvan û alîgirên han, xomalîkirin û birêvebirina pîşesaziyan weke mafek rewa û berheq yê kedkaran dihesibînin.

5. Sosyalîzma Mesîhî(Christian – Socialism): Alîgirên vê hizrê nêrîn û boçûnên xwe rasterast ji pirtûka pîroz(Încîl) wergirtine û piştre rûmet û şeklek siyasî jê re dayîne. Ew li gor bingehên pirtûka pîroz buhayek zaf didin zirûf û rewşa karker û zehmetkêşan û sosyalîzma mesîhî baştir ji sosyalîzma madeyî dihesibînin.

6. Sosyalîzma Marksî(Marxian – Socialism): Marks û alîgirên wî, sosyalîstên berî xwe bi sosyalîstên xeyalperest(Utopian – Socialiste) dihesibînin û li ser vê baweriyê ne ku di nav sîstemek kapîtal de, aboriya welat li ser bingeha milkdariya taybetî a alavên berhemanînê tê avakirin, lê berevajiyê vê çendê, di sosyalîzma marksîstî de milkdariya kargeh û alavên berhemanînê ji zehmetkêş û kedkaran re tê bexşîn.

7. Sosyalîzma Lîberal(Liberal – Socialism): Hizra han di sedsala 17'an li welatê Birîtaniyayê serî hildaye û tenê bawerî bi çavdêrîkirina alavên berhemanînê heye û li dijî çavdêriya li ser dabeşkirina berheman e.

8. Sosyalîzma Parlemanî(Parlemantary – Socialism): Hizra han ji aliyê **Jorj Sorl**, yek ji rêberên xwendingeha Sendîkalîzmê ku li dijî demokrasiya parlemanî bû, hatiye rojevê. Navhatî sosyalîzma lîberal a welatên demokrat red dikir û ew bi sosyalîzma parlemanî binav dikir û li ser vê baweriyê bû ku sosyalîzma parlemanî hertim xwe weke serwerê kedkar û parêzerên tekûziyê dihesibîne û heger serhildan û xwenîşandanên kedkaran bi awayekî rast û dirust werin rêberîkirin, eva bandora sosyalîzma parlemanî ji nav diçe.

Di civakên sosyalîstî de du curên milkdariya taybet di holê de ne, a yekem milkdariya giştî yan dewletî û ya duyem jî milkdariya bikom yan zibare, lê hevkariya du alî a takekesan bi ser her du modelên han de zal e. Di encama vê çendê de, çewisandina mirovan bi tevahî ji holê radibe. Bi liberçavgirtina vê hindê, sosyalîzm weke bilindtirîn qonaxa pêşkevtin û geşekirina civakê tê hesibandin û her çiqas ku civak pêşkevtî be, cudahiya bingehîn di navbera karê cesteyî û hizrî ji nav diçe û eva digihîje qasekê ku her kes li gor kar û jêhatîbûna xwe pişk jê re were dayîn. Ji bilî modelên sosyalîzmê ku me li jor qalan wan kir, em dikarin işarê bi modelên din yên weke sosyalîzma neteweyî, sosyalîzma welatperwerî û wd... jî bikin.

**Çavkanî:**

**(Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**

**(Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary" Daryûş Aşorî**

www.arsivakurdi.org

# 1’ê Gulanê Roja Cîhanî A Karkeran

**Amadekar: Hemîd Muxtarî**



Roja 1’ê Gulanê, roja rêzgirtin ji xebata mafxwazane a karkerên cîhanê ye. Hizra diyarîkirina rojeke taybet ji bo karkeran bi armanca dabînkirina 8 demjimêr karê rojane, yekemîn car di sala 1856’an li Ustraliyayê hate rojevê.

Karkerên wî welatî di sala 1856’an de biryar dan ku bona gihîştin bi armanca xwe, anku 8 demjimêr karê rojane, rojekê bi giştî neçin ser kar û di vê rojê de bi pêkanîna mîtîng, meş û şahiyan, daxwaza xwe a han bînin ziman. Ev rê û resme di 21’ê Nîsana sala 1865’an hate lidarxistin. Karkeran dixwastin tenê di vê salê de rê û resma han pêk bînin, lê yekemîn rê û resm bi awayekê li ser karkeran xwedîbandor bû ku wan biryar dan hemû salê rê û resma han dubare bikin.

Piştre karkerên Amerîkayî yekemîn kes bûn ku rêbaza karkerên Ustraliyayê domandin. Wan di sala 1886’an biryar dan ku roja 1’ê Gulanê bibe bêhnvedana seranserî. Di vê rojê de pitir ji 200 000 kes ji karkerên Amerîkayê bi neçûna ser karê xwe, daxwaza dabînbûna 8 demjimêr karê rojane kirin. Karkerên Amerîkayê serbarê hebûna astengên yasayî û azar û êşandineke zaf, di sala 1888’an de carek din daxwaza xwe ducar kirin û biryar dan ku rê û resma xwe a pêşîn di 1’ê Gulana 1890’an de lidar bixin. Piştre di kongireya Enternasyonala Karkeran di sala 1889’an li Fransayê ku pitir ji 400 şandên nûner yên karkeran tê de beşdar bûn, biryar hate dan ku daxwaza 8 seet karê rojane divêt tenê daxwaza sereke a karkeran be. Herwiha di kongireya han de şanda nûnerên karker ên Amerîkayî, bala beşdarên kongirê kişandin ser biryara hevalên xwe yên karker di Amerîkayê de ku biryar dabûn roja 1’ê Gulana sala 1890’an dest bidin gireva nerazîbûnê. Lewra kongirê biryar da ku bona rêzgirtin ji cehd û zehmetên karkeran, roja 1’ê Gulanê bibe Roja Cîhanî a Karkeran û ev roja weke bêhnvedana fermî hate diyarîkirin.

**Rewşa Karkeran li Îranê pirr dijwar e:**

Li halekê ku piraniya welatên cîhanê bi diyarîkirina rojekê weke bêhnvedana fermî di sal de, rêz ji xebata mafxwazane û zehmet û keda karkeran digirin, lê rejîma Komara Îslamî a Îranê ku salane bi hêcetên cur bi cur gellek rojan weke bêhnvedana fermî diyarî dike, heta hinek roj li Îranê weke bêhnvedana fermî hatine diyarîkirin ku tu pêwendiyek bi çand, dîrok û qazancên netewî ên xelkê Îranê tune, lê tu bihagiraniyekê nadin karkerên zehmetkêş ên Îranê. Di rejîma han de karker heta xwediyê mafê pêkanîna rêxistin, yekîtî, kombûn û girevgirtinê jî nînin û ger nerazîbûna xwe derheq rewşa karî îlan bikin, tevî derêxistin ji kar, zîndan û îşkenceyê berbirû dibin û eva di halekê de ye ku karkerên cîhana pêşkevtî, bi dehan sal e xwediyê mafên sivîl in.

**Li Îranê seba hebûna siyaseta şaş a aborî û siqetbûna aboriya welat û piştgirêdana rejîma Îslamî bi nifta xelkê Îranê ku pitir ji %80 ji dahata vî welatî pêk tîne, herwiha hebûna gendeliya diravî, girîngînedan bi xurtkirina pîşesazî û cotkariyê di welat de, bûye sebeb ku gellek kargeh û karxaneyên Îranê tevî daxistin û têkçûna aborî berbirû bin. Eva jî rasterast dibe sebebê jordeçûna asta bêkariyê di welatê me de.** Karkerên Îranê heta nikarin daxwaza heqdestê xwe ên mehane ku hinek caran bi qasî çend mehan paş dikeve, bikin.


Bo mînak pitir ji 150 karkerên Şaredariya Seqizê, 3 meh dibe ku heqdestê xwe wernegirtine.

**Seyîd Mihemedsalih Husênî**, çalakê karkerî li bajarê Seqizê, di vê derbarê de bi malpera “Dastranj”ê re got: Şaredariya Seqizê sedema nedana heqdestê karkeran vedigerîne ser nebûna budceya hewce a Şaredariyê.

Wî got: karkerên Şaredariyê ji tirsa derêxistin û ji destana karê xwe tu nerazîbûnek li ser berpirsên Şaredariyê neanîne ziman û tevî domandina kar û tabkirina xizanî û tengdestiyê, li benda wergirtina heqdestê xwe ne.

Yan derêxistina 85 karkerên bajaroka pîşesazî a Qirabadê li bajarê Seqizê. Tê gotin karkerên karxaneya Qirabadê seba kirîza aborî a karxaneya han hatine derxistin.

Di dawiyê de divêt em bibêjin ku tenê bi avabûna sîstemeke demokratîk û sosyal e ku karker dikarin bigîjin mafên xwe ên senfî û mirovî. Hindî ku dem dibore, jiyana kedkaran li Kurdistanê û Îranê dijwartir dibe û pirsgirêkên wan bê çareserî mane



www.arsivakurd.org

# YCDK Îranê Bi Fermî Bû Endamê Saziya "LNU"yê



Roja 25 û 26.04.2008'an, "**LNU**" ku saziyeke fermî a ser bi hikûmeta Norwejê ye, konferansa xwe a salane li nêzîk bajarê Oslo, paytexta vî welatî bi beşdariya 70 saziyên zarok û ciwanan birêve bir.

Şanda Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê komîteya welatê Norwejê ku pêkhatibûn ji **Muxtar Elyasî** û **Şoreş Elyasî** pêk hatibû, di vê konferansê de beşdar bûn.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ku di sala 2006'an de weke çavdêr di saziya han de hatibû wergirtin, di konferansên îsal de bi fermî weke endamê eslî hate wergirtin.

YCDK Îranê piştî endambûn di vê saziyê de dikare di konferansa pêşeroj de, berbijarê/a xwe hebe û herwiha niha pêde budceyekî diyarîkirî a salane ji aliyê saziya "LNU"yê derheq kar û çalakiyên rêxistina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê dê were diyarîkirin.

## Sê Lîstikvanên Girûpa Werzişî A Tekvandoyê Li Navenda 3 A Kurdistanê, Bawernameya Navnetewî Bidestve Anîn



Roja 06.05.2008'an, sê lîstikvanên girûpa werzişî a Tekvandoyê li Navenda 3 ya Kurdistanê, di ceribînên herî dawî yên taybet bi wê werzişê de ku bi beşdariya Tîpa Zeytûn a Koreya Başûr û 80 lîstikvanên Tekvandokar birêve çû, karîn bawernameya dana 2 a navnetewî bi dest bixin.

Bi vê hincetê di rê û resmeke taybet de, sê lîstikvan bi navên **Viyan Qadirî** di kêşa 50 kîlo de, **Dîlan Qadirî**, di kêşa 35 kîlo de û **Leyla Xûbanî** di kêşa 40 kîlo de, bawernameya Dana 2 a navneteweyî ya Tekvandoyê ji aliyê mamosta û pisporên Tîpa Zeytûn a Koreya Başûr di warê Tekvandoyê de wergirtin.

Hêjayî gotinê ye taqima werzişî a Tekvandoyê li Navenda 3 a Kurdistanê heya niha 5 caran di asta Kurdistan Başûr û çalakiyên Tîpa Zeytûn de beşdarî kiriye û herdem yan pileyên yekem yan duyem bidestve anîne.

## 18 Hezar Xwendekar Li Tehranê Aware Bûn




Serokê Îdareya Perwerdeya Tehranê, got: " Bi dana biryara betalkirina 90 xwendingehan, aliyê kêm 18 hezar xwendekar li bajarê Tehranê derbeder bûn".

Elîefşar Yezdanî, di hevpeyvîneke de tevî nûçevanê hikûmetî a "ISNA"yê, got ku %70 ji xwendingehên Tehranê pitir ji 35 salan e ku hatine avakirin, lewra bona çêkirina wan hewcehî bi xerceke zaf heye.

Navhatî her wiha îşare kir ku %47 ji pereyê diyarîkirî bona çêkirina xwendingehên Tehranê, ji aliyê kesayetiyên xêrxwaz ve tê dabînkirin û 321 xwendingehên vî bajarî jî bikirê hatine girtin.

## Kuştina Rojane A Xelkê Derdora Selmasê Her Didome



Li doma êrîşên hovane ên hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê û kuştin û birîndarkirina xelkê derdora bajarê Selmasê, çend rojan berî niha kesek bi navê **Hemîd Derûnsû**, temen 45 salî û xelkê gundê Bajêge a li Bakûrê Kurdistanê hate kuştin.

Navhatî ji aliyê hêzên dijî gelî ên rejîma Îranê yên cîgir di binkeya leşkerî a Sêroyê, hatiye kuştin.

Her wiha roja 07.05.2008'an, di encama êrîşa hêzên rejîmê li gundê Abazer li derdora bajarê Selmasê, nûciwanekî 15 salî bi navê **Daniş Îsazade**, jiyana xwe ji dest da û birê wî jî bi xurtî birîndar bû.

Roja 08.05.2008'an, nûciwanekî 17 salî bi navê **Mîlad Mihemedzade**, xelkê gundê Abazer, seba êrîşa hêzên tepeserker ên rejîma Îranê bi xurtî birîndar dibe.

Di cinayetekî din a hêzên rejîmê de, roja 07.05.2008'an, li gundê Çarsitûn li herêma Qutor a ser bi bajarê Selmasê, hejmarek ji kasibkarên sersînor dikevin ber êrîşa hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê û 2 kes ji wan bi xurtî birîndar bûn.

Her wiha çend rojan berî niha kasibkarekî Kurd li gundê Abazer(sînorê Îran û Tukriye) dikeve ber êrîşa guleyan û bi tundî birîndar dibe.

Her wiha roja 09.05.2008an, sê kesên din yên akinciyê gundê Dêlezî li herêma Şipîranê a ser bi Selmasê ji aliyê hêzên rejîma Îslamî a Îranê dikevin ber êrîşa guleyan û bi xurtî birîndar dibin.

Navê yek ji birîndarbûyiyan **Tajdîn** e û tê gotin ku ewên din bira jinbirayê wî ne.

Hêjayî gotinê ye ku hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê li ser sînorên herêma Şipîran a Selmasê cîgir bûne û ragihandine ku her kesî di 500 metriya sînor de bibînin, dê bidin ber êrîşa guleyan.

## Jinavçûna 20 Hezar Derfetên Karî Di Parêzgeha Sine De

Hişkesaliya bêmînak a îsal di Parêzgeha Kurdistanê de, pitir ji 20 hezar delîveyên karî di beşa cotkariya vê deverê de ji nav biriye.

Îqbal Rizayî, birêveberê "Xanê Karger" a Sine derheq vê çendê bi malpera "dastranj"ê re got: "Hişeksaliya îsal seba nebarîna baranê û kêmbûna paşkevtên binerd yên avê, bûye sebeb ku bêtirî 40 hezar cotkarên deverên cur bi cur ên Parêzgeha Kurdistanê tevî asteng û pirsgirêkan berbirû bin.

***

# JIYANEKE RÛMETDAR



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Jiyan, maweya navbera ji dayîkbûna mirov û bidawîbûna temenê wî/wê ango pêvajoya navbera bûyîn û mirinê ye. Her mirov bi qasî temenê xwe tê nasîn, zanîn û bibîranîn.

Bêşik, tu mirov jî piştî mirina xwe bi xerabî nayên bibîranîn. Her mirov piştî mirina xwe şayesteyî qadirdayîn û bîranînê dibe û tê pesinandin. Ew jî qerirdayîn, bîranîn û pesinandineke rastîn û ji dil e. Ji neçarî û bêzariyê ye.

Mirin, ji ber ku bûyereke hestyar û dilînî ye, gellek kesên mirî bi piroletî têne mezinandin û pesinandin. A rast ew e ku mirov di saxitiya xwe de were bîranîn û mezinandin. Hin kes hene pesinandin û mezinandin ji bo wan pirr kêm dimîne. Lewre gellek bûyerên ku di maweya sed salan de pêk nayên, di jiyana xwe ya kurt de hildidin û dihêwirînin. Kî ne ev kesên ku berî mirina xwe, raz û hîmê nemirbûna xwe kifş dikin û xwe di dilê gel de bicih dikin? Bê guman, kesên qenc, leheng û fedakar beriya mirina xwe jî têne pesinandin û ji hêla mirovan ve têne ecibandin û hezkirin.

Hêja ye ku mirov, jiyana ku bê vîna mirov pêk tê û bi vîna mirov re manîdar dibe, baş binase, bide zanîn û rave bike. Çima ligel ku gellek mirov di heman mawe û heyamî de ji dayîk dibin û di heman dem û serdemê de dijîn, bi qasî hevdû nirxdar û qerdbilind nayên dîtin. Sedema vê yekê ne tenê cih û civak, dem û serdem an jî awa û şêwaza jiyanê ye. Gellek sedemên din ên ku xwe dispêrin gihandin, perwerdekirin û şardekirina mirovan ku liv û bizav, ferset û kesantiya mirov dişêwînin jî hene. Ji bo jiyaneke rûmetdar hewcetî bi gellek tiştên ku jiyana mirov watedar dikin û wî/wê radigihînin pileyeke hêja û payeberz.

Tu qîmet û rûmeta pesinandin û qîmetdayîna mirov a piştî mirinê nîn e. Ji xwe her mirov di saxîtiya xwe de, ne kêm û ne jî zêde bi qasî degera xwe tê qedirdayîn û pesinandin. A rast jî ev e. Çimkî pesinandina mirov a piştî mirinê zêde ne rast e û ji dil e jî. Ya din jî ne mimkûn e ku her kes ji hêla herkesî ve were hezkirin, pesinandin û mezinandin. Her kes li gorî dilê xwe hin kesan liyaqî rêz û hezkirinê û her wiha şayanî qerdayîn û mezinandinê dibîne. Hin kes hene, ligel ku li gorî hin kesan bi qasî çiyayan mezin têne dîtin, li cem hin kesên din bi qasî qirş û qirûşekî nayên hesibandin.

Qedirbilindî, şanazî, serbilindayiya mirov di destê mirov de ye. Belê bêrûmetî, bêxîretî, serberjêriya mirov jî di destê mirov de ye. Ji bo wê pêşiyên kurdan gotine: "çê kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro"

Rast e. Kî çi dike bi xwe dike. Çêyî û xerabiya mirov li mirov vedigere. Gelo mirovên birûmet tu carî durûtî, fesadî û gelaciya mirovan dikin û wan berdidin hevdu? Gelo mirovên qenc arasteyî neqenciyê dibin û navbera mirovan kûr dikin? Gelo mirovên qedirbilind tu carî bêqedriya mirovan dikin û wan di çavên mirovan de biçûk dixin? Gelo mirovên serbilind tu carî serberjêriyê dikin?

Hin mirov hene dişibin dar û berên fêkî. Sûd û fêde ji wan sadil dibe. Zanîn, axaftin û tevgerên wan hemû bi wezn û pîvan in. Der û dora wan, dost û yarenên wan, heval û hogirên wan bi azwerî ser wan de dixuricin; bi rêzdarî li wan difericin û bi hejmetkarî li wan guhdarî dikin. Ew kes, hem li cem dost û yarên xwe û hem jîli cem dijber û neyarên xwe xwedan rûmet e û wekî kesên rêzdar têne dîtin.

Kesên rûmetdar, dem û domana xwe di riya başiyê de diserifînin. Hemû merc û derfetên xwe di oxira başiyê de dixebitînin. Pêwendiyên xwe bi kesên baş û rûmetdar re xurtir dikin. Tu carî li benda qencî û başiyê namînin. Ew bi xwe qencî û başiyê dafirînin û dikudînin. Fedakarî ji bo wan rêbaz û şêwaza jiyanê ye. Pêşdaraziyên wan ên pêşîn tune ne. Bi bêhêvîtî tevbanegerin. Ji bo tu kesî fikaran nakin. Bi şik û gumana xerabiyê eware nabin. Deriyê qenciyê bi destê xwe vedikin. Nêçîrvaniya xerabiyê nakin. Xweşbînî û hêvîdarî sedema hebûna wan e. Di feraseta wan de cihê reşbînî û bêhêvîtiyê nîn e.

Kesên rûmetdar, derewan nakin û bi derewan naxapin. Nefsbiçûk û bêpay in. Bi kesantiya xwe re li hev in. Tu kesî rûsar û şermezar nakin. Di bingeha pêwendiyên wan de armanc û mexsedeke bêdeman heye. Tiştê ku mirov pê zivêr û bêzar bibe nakin. Zû biz û ji mirovan naxeyidin û ji gel gazinan nakin. Gel û civakê sûcdar û tawanbar nakin. Mirovan nadehfînin. Ji mirovan hez dikin û xwe didin hezkirin. Gava ku nêzîkî mirovan dibin, nabêjin: "Bila ew başiyê bike peyre ez ê jî bikim" an jî nabêjin "bila ew qîmetê bide min peyre ez ê jî qîmetê bidimê" Xwe bi xwe dibêje: "Divê pêşî ez ê baş bim ku yên hemberî min baş bibin"

Kesên rûmetdar, ew in ku ji zar û zimanê wan, ji liv û tevgerên wan û ji hest û hizrên wan xerabî sadil nabe. Belê başiya wan ne ev tenê ye; her wiha mirov ji zar û zimanê wan, ji liv û tevgerên wan û ji hest û hizrên wan fêdeyê dibîne. Lewre ew bi xwe hem fêdekar û hem jî fedakar in. Ji bo wê her mirov nikare bibe xwediyê jiyaneke rûmetdar.

Wekî gotina dawî, bi rastî jî her kes nikare bi hêsanî û zû bi zû bibe liyaq û şayanî jiyaneke rûmetdar. Belê ji xeynî kesên berpirsiyar…

Kaniya Helbestan

## XERÎBÊ XWE



**Bêrî Bihar**

Çiqas tenik in dilên me,
Wisa tenik in dilên me,
Weke jiyana me,
Weke hewayê,
weke tozê,
Hema bi her nêrîn û gotinên yarê re
Li ber xeydê ne û dikin bişikên.

Tiştê me dixapîne,
Nêrîna me li jiyanê,
Yên bi ronahiya mûmikan,
Qels, jixwefedîkirî,

Ew giravên gir yên jiyana me,
Dibin hûrgulî di çavên me de.

Lewra,
Bi tenikî û hûrguliya gozegirên berikan
hûnandin bu, armanca me
ya jiyanê.

Lewra,
Wisa tenik in dilên me,
Weke jiyana me,
Weke tozê,
Çawa ezê berhev bikim dilê xwe
Yê ji tozê
Hûrik…hûrik

Diyariya rojê ye ew ritama min
ya ji tozan hevirkirî,
Bi edaya lehengiya tarîtiyê
li benda rojên xwe ye roj,
Li benda sewaxa xwe ya ritamê.
Ax xwezî zanibûna dilê min,
Xûşk û biratiya xwe ya
bi roja bi ritame sewax kirî.

Dilek bêhay bi derencoka dilê min ve
hildikişe,
Lewra,
Wisa tenik e dilê min,
Lê diqelibe,
Lê… nabîne û nabîne…

www.arsivakurd.org

# Muzîka Dermanî



**Wergerandin ji Farsî: Dilvîn**

Di cîhanê de ol û nejad zaf in, lê ziman û ruh yek in. Muzîk curek zimanê evînê ye.

### Mirov û Muzîk

Ji destpêka afirandina mirov virde, hewcedariyên cuda cuda (hem yên cismî û hem yên derûnî) pê re bûne û ji bo bidestxistina van pêwîstiyane û lihevkirin bi tepeş û dordorê jî mirov hewcedarên hinek alav û amûran bûye.

Huner weke yek ji alavên destpêkîn ên lihevkirina mirov di xizmeta hewcehiyên gihîştin bi kemal û qîmetê û xweşikî û bedewiyê û ji aliyekî din, dermanê aramkirina nereheti û dijwariyên jiyana wî/ê bûye. Muzîk şeklek ji hunerê yek ku hest, soz, têgihîştin û venasîna mirov bêy pêwîstî bi axivîn û ziman vediguhezîne.

mifahwergirtina mirov ji muzîkê, kareke hêsan û berdest bûye, ji ber ku rîtm û melodî wekî du hîmên bingehîn ên muzîkê, di hundirê mirov de hebûye û ji aliyekî din ve liv û tevgerên rîtmîk tu hewcehiyek di axivînê de tune bûn. Lewra di piraniya hoz û eşîrên destpêkîn de, rê û resm û şahiyên cur bi cur ên muzîkê ku alavek ji bo derikandin û xuyakirina sozdarî û hevpêwendiya giştî û jinavbirina tirs û xem û kulan û pêkanîna aramî, şabûn û kêfxweşî û vîn û îradeyê di nava takekesa/ê hoz û eşîran bûye, hatine lidarxistin.

Muzîk zimanê hêvî, xwezî û hest û sozên mirovan e û her gel û neteweyek li gor taybetmendiyên çandî û atifî ên xwe, muzîkek xasmanî heye. Bi têgihîştin ji muzîkê, hestên xweşik û bedew, hevderdî, lihevhatina bêtir a bidil dê cî bi cî bibe.

Lêkolînvan şîret û pêşniyara vê yekê dikin, dayîk û bav divêt rojê seeteke muzîkê ji bo zarokên xwe bigirin û ji wan re bidin guhdarîkirin.

Ev kare dibe sedema çêtirbûna rewşa xwarin, xew û zêdebûna kêşa wan.

### Muzîk û derman

Ji destpêka dîrokê virde, mirov ji muzîkê bona şefa û dermankirina nexweşan mifah standiye. Bo mînak, rîtma Diholê di rê û resmên dermankirina Cadûger û dermangeran de, roleke girîng hebûye.

Eresto dibêje: Mirov dikare ji muzîkê di gellek warên jiyanê de, mîna perwerde, sergermî û çelengî, derman, kêf û xweşî û kêmkirina hest û sozê mifahê werbigire.

Farabî zanayê navdar muzîkê bi sê taybetmendiyên wê ve dianî holê: hest û soz bizivandin, kêf û şahî bizivandin, xeyal bizivandin û wî gotiye ku di hin rewş û mercan de xwediyê her sê taybetmendiyan e.

Melodiyên muzîkê li gor hevdudaniya rîtmê xwediyê lerizînên taybet in ku bi liv û bizêva dermanên esebî hestekê bihêz û jar dike yan veduguhezîne.

Eger çi qazanc û feydeyên dermankirin bi rêya muzîkê li demên berê di rojevê de bûye, lê heta berî vê çendê ku di sedsala borî de weke şaxeyeke pisporane nehê nasîn, baş nehatiye naskirin.

Îroj li ser bandor û fêdeyên muzîkê di qonaxên cur bi cur ên geşekirin û jiyana mirov(li dewran ku mirov di zikê dayîkê de ye heta kaliyê ) giya û lawiran bas tê kirin û ji guhartinên wê li ser sîstemên hissî ên livandinê, coş û sozê, hişyar û zanyarî û nasîna takekes tê baskirin.

Bi gotina lêkolînên Navenda Bijîşkî a "New York"ê, guhdarîkirina muzîkên kilasîk û heta muzîka Cazê dibe sedema kêmbûna dilkute û tabkirina zêde a derdê nexweşan.

### Pêşgotinek li ser muzîka dermanî

Renge hetanî niha we hin mijar di rojane, kovar, cihê kar yan di nav xelkê de derheq muzîka dermanî xwendibe an bihîstibe. Muzîka dermanî şaxeke nû ye û tenê heyamê 50 salan e ku wekî pisporiyeke kilasîk û pîşeyî pêşde çûye.

Pêka pênaseyekê ku Civata Neteweyî a Muzîka Dermanî(NAMT) pêşkêş kiriye, muzîka dermanî pêk hatiye ji: "Bikaranîna muzîkê, dabînkirin, parastin û baştirkirina tendurustiya cismî û pîskolojîk, di rastî de muzîka dermanî bikaranîna serûber a muzîkê ye, bi awayekê ku muzîka dermanger rasterast li navendeke dermanî, guhartinên dilxwaz di liv, soz û riftarên mirov de pêk tîne.

Bi kurt û kinî di muzîka dermanî de, bi mifahwertgirtin ji muzîkê ku medyayeke hunerî a afirîner e, alîkariyê dide wan kesên ku xwediyê pirsgirêkên cuda cuda bi merama bidestxistina saxlemî û tendurustiya ruhî û cismî ne.

Muzîka dermanî di dermankirina kesên ku ne xwediyê karîn û şiyanên weke kêmhişî, derengketina geşekirinê, nivîşkanbûna cismî, nexweşiyên pîskolojîk û wd... in, bi awayekî bersivdar bûye.

Muzîka dermanger, armancan li gor hewcedariyên taybet ên dermanxwaz dişopîne. Ji bo pêşdebirina van armancane ji fen û teknîkên cur bi cur mifahê distîne. Bo mînak strangotin dikare hevkariyê bi nexweşên Alzaymerê bike heta bîr û xêva dirêjdem bikar bînin. Lêxistina alavên muzîkê bi hevtemenan yan kesên dermanxwaz dikare şarezayiya takekes zêdetir bike û liv û lebatên civakî çêtir bike. Ji hemûyan girîngtir eva ye ku takekes hestên xwe bi rêbazeke bawermend û bilezet bi awayê lêxistina muzîkê, guhdarîkirin û reqsîn bi muzîkê re dide xuyakirin.

Helbet divêt em bibêjin ku muzîka dermanî tenê ne di xizmeta kesên ku nivîşkan in, nahê bikaranîn, belku di merc û rewşên cur bi cur ên bijîşkî jî sûdewar in. Bi taybet kêmbûna zexên pîskolojîk û êş û derdan, zayîn, alîkarî bi nexweşên penceşêrê û kesên tûşbûyî bi derdên bêderman wekî îdzê(HIV). Pirsa sereke ku ji bo kesên han di rojevê de ye, kêmbûna êşê û tabkirina vê bi awayê derman e yan hevkarî bi nexweş re bona bidestxistina rewşeke çêtir.

Muzîka dermanî di nav salên dawiyê de di welatên cur bi cur ên cîhanê de bi xurtî pêş ketiye û karên dermanî ên cuda cuda ji aliyê muzîka dermangeran çê bûne û li ser vê yekê tekez hatiye kirin ku bi giştî muzîk di dermankirina kesên tûşbûyî bi rewşên cur bi cur ên bijîşkî, bandoreke zaf heye.

Di vê nivîsarê de bi kurtî ji we re mijara **muzîka dermanî çiye?** Hate pênasekirin. Ev gotare tenê beşeke biçûk û kêm ji vê şaxeya pisporane a mezin û berfireh nasandiye û mirov nikare bi awayekî giştî encamekê ji vê bigire. Vê yekê hewcehî bi lêkolîn û dahûrandina zêdetir heye û her kes dikare li pey vê mijara girîng bigere.

***

www.arsivakurd.org


# Şiroveyek Kurt Li Ser Helbestê Û Sedemên Serhildana Wê


Simko Bêkes

Dema ku em bixwazin basa helbestê bikin, ya baş eva ye ku em berî her tiştekê vegerin bo ser sedemên serhildana helbestê. Di rastî de helbestgotin û nivîsîna helbestê ewqas dîrokekî kevin û dûr û dirêj di wêjeya gelên cîhanê de heye ku bûye sedema cihgirbûn di nav malbata wêje û kultura netewan de û girîngiyekî taybetî jêre hatiye dayîn û di wêje û kultura Kurdî de jî çelengane di vê qadê de mijûlê berevanîkirinê bûye bo elenda serkevtina xwe.

Wek xuya ye, ji bo zanîna dîroka




helbestên Kurdî karekî ne hêsan e û ewa karê dîroknivîsan e ku di vê derheqê de lêkolînan bikin û li dû van serhildanane de bigerin ku bûne hêvênê çêbûna helbestê. Lê bi baweriya min tevî vê hindê ku Kurdan kariye peyvan danê cem hev û bike hevok û bixemilîne û wezn û qafiyeyê jêre çêbike, cure hevgirtinek bi xwe ve girtiye û ewa bûye hegera serhildana helbestê û wê demê dev bi dev geriyaye û tenê di dîwanxaneyan de şevbêrkên helbestgotinê hatine lidarxistin ku hemî ewane hêvênê xwegirtinê bi xwe ve dîtiye, heya dawiyê, tevî peydabûna pênûs û tênûsê, helbestê cihê xwe li ser rûpelên tênûsan peyda kir û karî di vê derheqê de cih û pêgeha xwe peyda bike. Bo derkandina vê hestê jî em dikarin qala navê hin ji wan helbestvanên sedsala derbasbûyê bikin ku di vê derheqê de çelengane xebat kirine û bûne helbestvanên mezin yên gelê me û heya niha jî helbestên wan dev bi dev, mal bi mal û nivîsar bi nivîsar di wêjeya Kurdî de cihê xwe girtiye. Bo mînak helbestvanên weke**: Nalî, Xanî, Melayê Cizîrî, Mehwî, Hecî Qadir Koyî, Qanii, Goran, Mewlewî, Seyfî Qazî, Xalemîn, Siware, Hqîqî** û **Hawar** û zaf helbestvanên din ên gelê me ku çelengane karîne di vê derheqê de xizmeta gel û nîştimana xwe ya bindest bikin û pirr caran bi helbestên xwe xelk bo serhildan û rizgariya Kurdistanê hay dane.


Mirov herçiqas li gor şiyan û derkandina peyvên bedew û zelal û bi hestê wan helbestvanane bibêje hêj kêm e, lê em dikarin her vê hindê bibêjin ku ger ev helbestvanane nebana, vehûnana helbestên Kurdî nedigehîşte wê asta niha jî. Lewra di sedsala derbasbûyî de, piraniya helbestvanên Kurd, helbestên kilasîk dinivîsandin û diviya tev bendên helbestê wezin û qafiye a wê jêre hatiba dayîn, lê mixabin îro ev awayên nivîsînê zaf kêm bûye û piraniya helbestvanên vî serdemî mijûlê helbesta nû ne.

Niha helbesta Kurdî bi piranî bingehekî nû bi xwe re girtiye û keç û xortên me zêde hezkiriyên wan cure helbestan in û di şopa helbestekî nû û zelal de digerin ku bikaribe eyankerê seh, soz, derûn, hizr û bîra ciwanan be di vê jiyana nû û îroyî de.

Îro tevî wan guhartinên serdem û bikaranîna teknolojiyaya nû û evroyî û herwiha peydabûna komputer û bikaranîna wê ji aliyê her takekî civaka Kurdî ve, helbest jî di wêjeya Kurdî de ketiye nava çarçoveyekî din û di hezaran malperên înternetî de cihê taybetî jêre hatiye diyarîkirin.

Bi berçavgirtina vê rastiyê em dikarin bibêjin ku helbest di wêjeya Kurdî de bi awayekî baş bingeha xwe girtiye û di nava ragihandin û medyayên Kurdî de û herwiha bi lidarxistina kombûn û civînên taybet ji helbestvanên Kurd re, biha û girîngiyekî taybetî ji helbestê re tê dayîn.

Divêt were gotin ku li dû geryana serhildana helbestê di nava hinav û hestê helbestvan de, herdem eyankerê hestê hundirê helbestvan di demek taybetî de ku mirov nikare dem û satê jê re diyar bike û tenê di van demane de ku tiştekî balkêş dibe hegera serhildana wî hestî û dibe vehûnanek nû ku dikare vehûnanek




evîndarî, xwezayî, civakî yan nîştimanî be.

Derxistina hinderekî çêkirî, dikare hayderek girîng be ji bo derikandina çax û demekê ku seha rûyê bedew yê mirov û xweza yan civak û her mijarek din be, ev derkandine dibe berjeng û hêvêna vehûnanek wisan ku takekesê/a Kurd îro ecêbmayî maye û heta parek zaf ji mirovan bûn xwendevan, bîner û guhdarên helbesta Kurdî û mirovê helbestvan jî kariye cihê taybetî yê xwe di civakê de peyda bike.

Vehûnandina helbestê divêt li ser bingehekî baş hatibe darêtin ku destpêk û kakila wê xuya be û xwendevan yan guhdar bi başî bikare li mana û merema helbestvan tê bigihîje û xwendevanan di dema xwendina helbestê de tamê jê wergire.

Di dema berê de helbest tenê bo xweşikiya jin û xwezayê, yan bone û bîranînên taybetî dihate gotin, lê bi xweşî ve ev taboya hatiye şikandin û hêdî hêdî jinên Kurd bi germ û gurriyek xasmanî re ji bo mêran helbestan dinivîsin ku ewa nîşana pêşveçûna bîr û hizra civakê ye. Dibêjin ger jin nivîya civakê ye ku wisan bû nîva din a civakê jî mêr in. Bila jinên Kurdan jî hewl bidin ku pesna vê nîvê bikin ku bi nîva din a civakê hevdu dikemilînin.

Ger lencewlar û ciwaniya keçekê, helbestvanekî bi coş tîne û dibe xeyala pêvegotinekî çîvanok, helbestvanî û hêvênê serhildana vehûnandinek nû. Çima bejn û bala mêrekî nekare derbirê hestên keçeke helbestvan be û di seha ciwaniya jinekê de pesna wî bihê kirin.

Di dawiyê de dibêjim ku helbest yanî serhildana peyvên ciwan, zelal û seha dil û hundirê mirovek ku jê re dibêjin helbestvan.

**Dara Natiq kiriye Kurmancî**

www.arsivakurd.org


Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



## Kurdî Di Nav Lîsteya Zimanên Bi Bandor Ên Cîhanê De Di Rêza 31'an De Cî Girt




Kovara naskirî li ser ziman a "Le Français Dans Le Monde" ya Fransî ku di vî welatî de weşana xwe dike, lîsteyek li ser zimanên cîhanê ên herî bi bandor û dewlemend weşand û Kurdî jî weke ziman di nava vê lîsteyê de cî girt. Li gor lêkolîna kovarê ku di hejmara wê ya 335'an de hate weşandin, Kurdî ligel hemû asteng û qedexekirinan jî, di nava hezaran zimanan de di rêza 31'an de cî digire.

Pîvan û krîterên bingehîn ên kovarê ev in:

Hejmara mirovên ku wî zimanê bikar tînin, rêzdariya wî ya li înternetê, hejmara welatên ku lê zimanê fermî ye, hejmara wergerên ku hatine kirin, Fîlm, muzîk û pirtûkên ku bi vî zimanî hatine çêkirin û weşandin û pirtûkên rêzimanî û xebatên li ser ziman.

Di lîsteya kovarê de hatiye diyarkirin ku Îngilîzî zimanê herî bi bandor ê cîhanê ye.

Di lîsteya kovarê de 10 zimanên herî bi bandor ên cîhanê ev in: 1) Îngilîzî 2)Fransizî 3) Îspanyolî 4) Almanî 5)Japonî 6) Flamanî 7)Erebî 8) Swêdî 9) Îtalyanî 10) Danîmarkî

Balkêş e her çiqas zimanê Kurdî di bin zexta zimanê Turkî û Farisî de ye jî, di lîsteyê de Tirkî di rêza 25'an de û Farisî jî piştî Kurdî di lîsteyê de cih girtiye.

## Hêzên Komara Îslamî Zozanên Çend Deverên Herêma Kurdistanê Topbaran Kir



Roja sêşem û çarşem, 13-14'ê Gulana 2008'an, hêzên Komara Îslamî a Îranê careke din hin deverên Herêma Kurdistanê bi xurtî topbaran kir. Hêzên Komara Îslamî piştî ku bi xurtî hin deverên Pişderê da ber êrîşa topbarana xwe, devera Biradost ya ser bi navçeya Sîdekan jî hate topbarankirin.

Ajansa Nuçeyan a PUKmedia'yê jî ev nûçe piştrast kir û diyar kir ku di van du rojane de hêzên Îranê zêdetirî 50 guleyên topan avêtin zozanên Lolanê ên li navçeya Sîdekan a Herêma Kurdistanê.

Çend rojan berî niha jî Hêzên Komara Îslamî zozanên Deşta Herîr û Deşta Diyana toparan kirine û hêj tobparankirina van deveran ji aliyê Îranê berdewam e.

Tê gotin ziyan û zererên zaf gihîştiye xelkê van deverên Herêma Kurdistanê.

## 40 Ji Sedê A Goriyên Bahoza Miyanmarê Zarok İn




Di çend rojên borî de bûyereke dilêş cîhan hejand. Ev jî bahoza tund a Miyanmarê (Bûrma)bû ku ajansên nûçeyan eşkere kirin di encama erdhejê de dehan hezar kes mirine û çend milyon kes koçber û derbeder bûne. Unicef Sindoqa Zarokan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, roja sêşem, 13'ê Gulana 2008'an ragihand ku qasê 40 ji sedê a goriyên bahoza xurt a Miyanmarê ku jiyana xwe ji dest dane zarok in. Dan Kalînson Berdevkê Unicef'ê di vê derbarê de got ku %40 ji nifûsa welatê Miyanmarê ku mirine zarokên bin temenê 18 saliyê ne, ji ber ku zarok ne xwediyê îmkanat û şiyana bona rizgarkirina canê xwe ji vê bahoza tund bûne.

Rewşa goriyên vê erdhejê pirr xirab e, lê serbarê vî halî jî hêj rêberên leşkerî ên vî welatî rê nadin ku alîkariyên navneteweyî bigihîjin xelkê. RNY diyar kir heke hevkariyên lezgîn yên xwarin, vexwarin, derman û nojdariyê negihîjin Miyanmarê, jiyana bêtirî yek milyon mirovan bi micidî dikeve xeterê.

## Hejmara Miriyên Erdheja Çînê Zêdetir15 Hezaran E



Seet 14:28'an ya roja duşem, 12'ê Gulana 2008'an, erdhejek mezin bi xurtiya 7.9 rîşterê li çend eyaletên Çînê pêk hat. Tê gotin ku aliyê kêm 15 hezar kes mirine û dehan hezar kes jî birîndar bûne. Zirar u xisarên faz gihîştiye gellek cade, rê û mal û avahiyan. Ev erdheje di 92 kîlometriya eyaleta Sişuan a Bakurê Rojavayê Çînê de pê hat. Erdheja 12'ê Gulana 2008'an goriyên herî zêde di 22 salên borî de heta niha li Çînê girtine. Di sala 1976'an jî erdhejeke mezin li Bakurê vî welatî pêk hat û bû sedema mirina 242 hezar kesan.

## Li Rûsiyayê 2 Milyon Û 720 Hezar Kurd Hene



Vagîf Girayf berpirsiyarê Kunsolxaneya Rûsyayê li Hewlêrê ev yeke piştrast kiriye ku di Rûsyayê de 2 milyon û 720 hezar Kurd weke hevwelatiyê Rûsî di vî welatî de dijîn. Tê gotin ku Rûsya dixwaze pêwendiyên germ û berfireh bi Herêma Kurdistanê re pêk bîne û heftiya borî Yergeyî Pirîmakov Serok Wezîrê berê yê Rûsyayê çend rojan mêvanê Herêma Kurdistanê bû.

www.arsivakurd.org